

Encamnameya Forûma Edaletê Ya Ji Bo Îradeya Gelan

Forûma “Ji bo îradeya gelan edalet” ya ji aliyê Lijneya Rêveberiyên Herêmî yê Demokaratîk ve di çarçoveya kampanyaya “Ji bo her kesî edalet” ya 8’ê sibata 2021’ê hat destpêkirin, bi tevlîbûna Baroyên Herêmî, Karsaz, Rûspî, Hilbijartî, Koordînasyonên Piştewaniyê yê Zanîngehan, Piştewaniya Bogazîçiyê, Platformên Jinan, Rêxistinên Bawerîyan, Komele, Sendîka, Odeyên Pişeyan û nûnerên STO’yan jî di nav de, ji sêsedî zêdetir kesan li Mêrdînê pêk hat. Di civînê de; mijarên mîna êrîşên li dijî HDP’ê yê siyasî û darazî, betalkirina parlamenterîyan, Peymana Stenbolê, êrîşên li dijî civakê, tayînkirina qeyûman li ser şaredarî û zanîngeha Bogazîçiyê û cîniyetên jinan li ser gelek mijaran nîqaş hatin kirin. Di vê çarçoveyê de di nirxandinan de ev derketin pêş:

Em ê qeyûman nas nekin

Demek e dirêj e, Tirkiye ji aliyê kesekî ve tê birêvebirin. Rejîma yekkesî îradeya gel nas nake, ji bilî xwe her kesî bi terorîstiyê sûcdar dike. Daxwazên hevkarê biçûk pir bi lezgîni ji aliyê hevkarê mezin ve bi cih tên û mafên herî bingeşên tên xespkirin. Yê behsa demokrasiya sindoqê dîkin, di rewşa heyî de îradeya bi sindoqan diyar bûye bînpê dike, kesên ji aliyê gel ve hatine hilbijartin ji peywîrê digire û wan davêje zindanê. Em ê wek berê, niha jî li hemberî vê ferasetê li ser bingeşa mafên bigehî têkoşîna xwe heta dawiyê bidomînin. Em ê her tim rastiye li rûyê zaliman bêjin.

Rejîma qeyûm ya bi xespkirina 95 şaredariyên DBP’ê di 2016’an de dest pê kir; îro roj li tevahiya Tirkiyeyê di meriyetê de ye. Tehemûla desthilatê li hemberî muhalefetê nemaye û di her firsendê de ji bo dengê wan bîtepsîne êrîş dike. Qanûna ku li meclîsê hat qebûlkirin û civaka sîvîl dike hedef û pêşî li tayînkirina qeyûman vedike, encama vê rejîma zordar e.

Ciwanên ku di nav muhalîfan de herî zêde dengê wan dertê, di vê serdemê de dîsa bûn hedefa rejîma yekkesî. Ciwanên ‘dislike’ dîkin û dibêjin ji bo we ‘deng meng tune ye’ bûne xewnereşka rejîma yekkesî. Tayînkirina qeyûm li ser zanîngeha Bogazîçiyê nîşaneyê vê tîrsa wan e.

Em ên demokrasiyê dixwazin û kesên dixwazin îradeya wan bê naskirin, em ê qeyûman nas nekin û bi biryardarî em ê têkoşîna xwe ya li dijî rejîma qeyûm bidomînin ku dixwazin li her dera welêt serwer bikin. Dê qeyûm herin û îradeya gel bi ser bikeve!

Em ê tecrîdê bişikînin

Hevparên îktîdarê hiqûqa xwe û hiqûqa navneteweyî bînpê dîkin û nahêlin birêz Abdullah Ocalan mafên xwe yê hiqûqî bi kar bîne. Ji ber ku li Îmraliyê li ser birêz Ocalan tecrîdeke giran heye hemû welat ber bi felaketê û rojên tarî ve diçe. Ji ber ku îktîdar di tecrîdê de îsrar dike di nav civakê de alozî bêtir zêde dibin. Îro 128 roj in li girtîgehan bi armanca tercîd were rakirin greva birçîbûnê hatiye destpêkirin û ev daxwaz qêrîna li dijî tecrîdê ye. Di 21’ê adarê de bi milyonan kesan qadên Newrozê tije kirin, piştgirî dan daxwaza girtiyan û bi dengê bilind ji hemû kesî re ragihandin ku divê polîtîkaya tecrîdê were bidawîkirin. Em ê jî bi

piştgiriya gelê xwe li hemberî polîtîkayên tecrîdê ku Tirkiyeyê tarî dike, têkoşîneke hevpar bimeşînin.

Em ê Peymana Stenbolê biparêzin

Tayînkirina qeyûman wek siya rejîma yek zilam e û li herêman polîtîkayên dijberiya jinan didomînin. Qeyûman dema dest bi kar kirin wekî karê ewil deskeftiyên jinan hedef girtin, zilam tayînî midûriyetên jinan kirin, li aliyekî midûriyet bêbandor kirin û li aliyê din jî saziyên jinan hatin bêbandorkirin. Ji bo jinên ku rastî tundiyê tên ‘Xetên Alo Tundî’ (Alo Şiddet Hattı) hatin vekirin û ev xet jî ji aliyê qeyûman ve hat betalkirin. Di vê pêvajoyê de stargehên jinan û navendên jiyanê ya jinan hatin bêbandorkirin û wisa kirin ku ev navend bi awayekî fiilî xebatên xwe nedin meşandin.

Hişmendiya qeyûmparêz ku welat ji rêve dibe, Peymana Stenbolê ku di encama nîqaşên salan de hatiye amadekirin bi şevê rakirin. Hişmendiya mêrê serdest a îktîdarê bi rakirina vê peymanê ve feraseta xwe ya li hemberî jinan careke din dan nîşandan. Bloka AKP-MHP’ê bi vê biryarê ve ragihandiye ku xwedî li tecawizkaran derdikevin û her wiha piştgirî dan tecawizkaran. Ji ber vê yekê li Tirkiyeyê qatîlê jinên ku tên qetilkirin ev îktîdara faşîst e. Îktîdara AKP-MHP’ê careke din diyar kirin ku dijminên jinan in.

Em ê biryara yek zilam a xwevekişandina Peymana Stenbolê nas nekin û vê biryarê qebûl nakin. Jinan di encama têkoşîna salan de wek deskeftî Peymana Stenbolê bi dest xistin û em ê li hemberî feraseta zilamê serdest vê peymanê biparêzin.

Em dê xwedî li zimanê xwe, çanda xwe, axa xwe û zanavê xwe derbikevin

Hemû civakên kêmnê en ku li Tirkiyeyê dijîn bi êrîşên sistematîk en îqtîdarê re rû bi rû mane. Nahêlin ku gel bi zimanên xwe biaxivin, mafê wan ê perwerdeya zimanê zikmakî tê astengkirin, jîwarên wan ji bo berjewendiyan şexsî tên talankirin, çanda wan tune tê hesibandin. Perestgehên aîdê civak û baweriyên cuda ji aliyê desthilatdariyê ve ji bo ji ser rant bi dest bixin vediguherînin cihên turîstîk. Desthilatdariya ku li ser hesasiyetên dînî propagandaya xwe ya siyasî dimeşîne û li ser vê yekê nêzîkî komên baweriyên yên cuda cuda dibe, di babeta durûtiyê de nimûneyeke berceste ye.

Em ê ji bo gelê kurd û hemû gelên li Tirkiyeyê dijîn; zimanê xwe, çanda xwe, baweriya xwe, axa xwe û zanava xwe di çarçoveyeke azad de bijîn têbikoşin.

Em ê hizra HDP’yê bidin jiyîn

Li ser îsrar û hedefnîşandana şîrîkê piçûk yê desthilatdariyê û bi erêkirina şîrîkê wê yê mezin re Serdozgeriya Komarê ya Darazê ji bo girtina HDP’ê serî li Dadgeha Destûra Bingehîn xist û doz da vekirin, ev yek nîşaneyê rizîbûna siyasî ye. Ew her du şîrîkên ku ji hêla siyasî ve li beramberî HDP’ê têk çûne bi rêya darazê dixwazin HDP’ê ji qada siyasetê bidin tasfiyekirin. Ji wê doznameya eletewş jî dixuyê ku ev biryar ne hiqûqî ye û aşkera ye ku bi egerên siyasî hatiye amadekirin.

Armanca bloka AKP-MHP ya desthilatdariyê ew e ku di nav gel de ragêşîyan zêde bike. Bo vê yekê zimanê siyasetê yê ku gel cuda dike û berberiyê dixê nav gel bi kar tîne. Nûnerên faşîzmê yên ku HDP'ê û gelên ku dengê xwe dane HDP'ê kirine benûştê devê xwe, di vê pêvajoyê de jî dev ji gotin û gotarên xwe yên çors bernedan. Ew milyonên ku di 8'ê adarê û 21'ê adarê de qadan dagirtin bûne bersiv li dijî vê ferasetê.

Doza girtinê ya ku li ser HDP'ê hatiye vekirin, parçeyek ji hewldanên; serkutkirin û bêdengkirina civakan e. Em ê mîna hemû aliyên demokrasîxwaz, di vê pêvajoyê de, li cem hev bin û li dijî faşîzmê, di xeta têkoşîna hevpar de tim li ber xwe bidin. Em ê destûrê nedin ku HDP bê girtin û em ê hizra HDP'ê li hemû qadên ku em lê ne bidin jîyin.

Lijneya Rêveberiyên Xwecihî yên Demokratîk

2 nîsan 2021